Freie Demokraten FDP

Kurte **Bernameya Hilbijartinê**

# Her tişt dikare were guhertin.



Christian **Lindner**

**Dengdêrên hêja,**

**Almanya xurt e. Lê awayê jiyana me û hebûniya me di bin xeteriyê de ye. Ji ber vê yekê em ji bo siyaseteke nû têdikoşin. Ji bo bacên kêmtir, da ku ked û kar hêja be. Ji bo aboriya bazarê ya bihêz ya ku cihên kar ewle dike. Ji bo civakek azad ku bi berdewamî koçberiyê kontrol dike.**

**Ji bo perwerdehiya ku ji her kesî re pêşveçûnê mimkûn dike. Ji bo dewletek zirav ku li şûna burokrasiyê encaman pêşkêş dike. Tenê bi vî awayî em dikarin geşesendina aborî, ewlehiya civakî û berpirsiyariya ekolojîk ji bo pêşerojê biparêzin.**

Christian **Lindner**




# Ked û kar divê hêja be.

**Em hewil didin ji bo bêtir dahata safî ji brûtê û ji û ji bo dabînkirina teqawîtiya adil ji bo hemû nifşan.**

Em dixwazin bacê kêm bikin da ku barê welatiyan sivik bikin. Ev jî van yekan ji xwe digre: kêmkirina zikê çîna navîn û sererastkirina otomatîkî ya baca dahatê li gorî enflasyonê, bilindkirina rêjeya alîkariya bacê ya bingehîn, rakirina lêzêdekirina piştgîriyê û rêjeya bacê ya herî bilind ku ne ji hêla çîna navîn ve, lê tenê ji hêla kesên xwedî dahata herî bilind ve tê dayîn.

Ji bo ku mirov di temenê xwe yê pîrî de jî sûd ji ked û karê  xwe werbigre, divê hemû welatî karibin tedbîrên maqûl bistînin. Ji ber vê yekê em di plansaziya teqawidiya taybet de piştgirî didin teserûfa pardariyê. Û em parêzvaniya ji bo teqawidiyek pardariyê ya zagonî ya rastîn berdewam dikin.

Freie Demokraten FDP

Her tişt dikare were guhertin

# Geşesendin ji bo hemiyan.

**Tenê aboriyek bihêz karên baş diafirîne.**
**Ji ber vê yekê em ji bo veguhertina aborî têdikoşin.**

Ji bo vê yekê em dixwazin: Ku burokrasiyê bi awayekî radîkal kêm bikin, hewcedariyên amadekrina raporan yên bêwate ji holê rakin, enerjiyê erzantir bikin, bacê kêm bikin, bêtir bazirganiya azad dabîn bikin, şehadeyên biyanî zûtir nas bikin û ji karkerên jêhatî re bibin balkêş.

# Derfetên bi rêya perwerdeyê.

**Pêşeroja me di nav mirovan de ye. Bi perwerdehiya nûjen, em potansiyela wan şiyar dikin û ji derfetên hikişanê diafirînin.**

Divê derfetên perwerdehiyê bi mala dêûbavan û cihê rûniştinê ve girêdayî nebin. Em dixwazin li seranserê Almanyayê standardên perwerdehiya bilind yên yekreng û yeksan biafirînin - ji navendên lênêrîna zarokan heta qedandina dibistanê. Ji bo vê yekê, divê hikûmeta federal di perwerdehiyê de rolek bihêztir bigire ser xwe.

Em daxwaz dikin: Îmtîhanên ziman di temenê pêşdibistanê de û herî dereng polên sinifa sêyemîn, teknolojiya herî dawî û bêtir azadiya plansaziyê ji bo dibistanên me û her weha BAföG´ê ku ji dêûbavan serbixwe be, da ku ciwan bi rastî karibin xwendina xwe bi serbestî hilbijêrin.




# Di ewlehiyê de azadî.

**Em piştgiriya dewleta destûrî ya lîberal dikin, ku ewlehiyê dabîn dike û rêzê li mafên sivîl digire. Bi vî awayî em pêkve jiyanê di nava azadiyê de mimkûn dikin.**

Divê mirovan li welatê me li cihên giştî xwe ewle hîs bike. Ji ber vê yekê em dixwazin saziyên ewlehiyê xurt bikin. Ev dikare bêyî sînordarkirina mafên sivîl bi çavdêriya nû were kirin. Em di koçberiyê de rêkûpêkî û kontrolek zêdetir dixwazin. Emê ji koçberiya neqanûnî re sînorê deynin. Li Ûkraynayê jî azadiya me tê parastin. Ji ber vê yekê divê Almanya li kêleka gelê Ukraynayê bisekine. Divê ji artêşa federal re amûran were dayîn da ku karibe bi bandor welatê me biparêze.




# Dewleteke zirav, aboriyeke saxlem.

**Elmanya pêdivî bi dewletek zirav û dîjîtal heye ku xizmeta welatiyên xwe bike û zordestiyê li wan neke.**

Heger dewlet di gelek qadên jiyanê de mudaxele bike lê erkên xwe yên bingehîn pêk neyne, hingê reform pêwîst in. Em dixwazin wezaretan pêkve girê bidin û qada îdarî zirav bikin. Bi vê yekê em pereyên bacê berhev dikin û berpirsiyariyên zelal diafrînin.

Divê wezaretek dîjîtal polîtîkaya nûjeniyê ji çavkaniyek yekane misoger bike. Em dixwazin ku xizmetên giştî bi awayekî xurttir ji razîbûna welatiyan re nêzîktir bikin. Bi frena deynan re, em bingeha dewletek zirav xurt dikin: Aboriyeke saxlem.

Freie Demokraten FDP
Her tişt dikare were guhertin

# Pênc sedeman ji bo FDP´yê:

1. **Kesd û kar divê hêja be.** Em hewil didin ji bo bêtir dahata safî ji brûtê.

2. **Geşesendin bi kêrî hemiyan tê.** Lewma tenê aboriyek bihêz karên baş diafirîne.

3. **Di ewlehiyê de azadî.** Em saziyên xwe yên ewlehiyê xurt dikin. Em koçberiyê sînordar û birêkûpêk dikin.

4. **Hilkişîn bi rêya pewerdeyê.** Da ku her kes şansê serkeftinê hebe.

5. **Dewlerteke Zirav.** Karên xwe bi lez û bez û li gorî welatiyan pêk tîne.

## Dem dema guhertina rê ye.

## Ji ber vê yekê, di 23.02.25´an de dengê xwe bidin FDP´yê!

Weşanger:
**Partiya Azad a Demokratîk (FDP)**
**Navenda Federal**

Reinhardtstraße 14
10117 Berlin
info@fdp.de

Hûn dikarin hê sedemên bêtirji bo FDP´yê li vir bibînin: